Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar :1156 · 31-Adar- 2024 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Pirtûkçeya 'Karwanek Ji Peyvên Azad' çap bû




Pirtûkçeya bi navê "Karwanek Ji Peyvên Azad" bi armanca bîranîna şehîd Karwan Hewram çap û bilav bû.

Şehîd Karwan Hewram ku gerîla, şoreşger û di heman demê de dîtorê Servîsa Farsî ya ajansa ANF'ê bû di 14'ê Nîsana 2023'yan ji ber nexweşiyê şehîd bû.

Bi boneya bîranîna şehîd Karwan ku di dilê hemû hevrê û hevxebatên xwe û hemû wan kesên ku wî nas kiribû cihê xwe girtibû, pirtûkçeyek ya bi navê "Karwanek Ji Peyvên Azad" ku demek bû ji aliyê Komîteya Şehîdan a PKK'ê ve dihat amadekirin hat çapkirin.

Di pirtûkçeyê de ku ji daxuyanî, nivîs, bîranîn û nirxandinên di derbarê jiyan, sekin, têkoşîn, hevaltî, şoreşgertî, milîtantî û kedkariya şehîd Karwan Hewram re cih hatiye dayîn, her wiha di beşa dawî ya pirtûkçeyê de jî albûmeke wêneyên şehîd Karwan hatiye çêkirin.

# Kargeha Lîlît cil û bergên çanda Kurdî zindî dihêle

**Dizaynera Kargeha Lîlît a cil û bergên Kurdewar Nûrhan Abdullah, der barê kargeha Lîlît a ku hemû cureyên cil û bergên çanda Kurdî çêdike û hem jî karên destan çêdike wiha got: "Armanca me ya vekirina kargehê zindîkirina çanda cil û bergên Kurdî ye."**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku şoreşa jinan ber bi 12 saliya xwe ve diçe, jin di hemû warên jiyanê de hebûna xwe diyar dikin. Dizaynera Kargeha Lîlît Nûrhan Abdullah, têkildarî kargeha Lîlît û kar û xebatên ku jin di kargehê de dimeşînin ji ajansa me re axivî.

**'Cil û bergên çanda Kurdî zindî dikin'**

Nûrhan Abdullah, behsa armanca vekirina kargeha Lîlît kir û wiha got: "Ez li kargeha Lîlît dizaynera cilan dikim, ez cilan dibirim û jinên din jî didirûn. Nêzî 5 sal in me ev kargeh vekiriye, armanca vekirina me ya kargehê, zindîkirina cil û bergên çanda Kurdî ye. Ji ber ku beriya niha tenê cil û bergên Kurdî di cejna Newrozê de dihatin lixwekirin, lê di roja me ya îro de Kurd di hemû şahiyên xwe de cil û bergên Kurdî li xwe dikin. Beriya ku em kargeha xwe li bajarê Qamişloyê vekin, me li navçeya Amûdê kargeh vekiribû. Me hem ji bo Kurdan, hem jî ji bo pêkhateyên Suryan û Kurdên Êzidî cilan çêdikir."

**'Desteya Çandê piştgirî da me'**

Nûrhan Abdullah, bal kişand li ser zehmetiyên destpêkê hatin jiyîn û wiha got: "Destpêkê zehmetiyên me hebûn. Me dixwest ji bo ku em cilên xwe pêşkêşî gel bikin, dikanek mezin vekin, lê derfeta me ewqas tunebû. Di heman demê de me dixwest dikanek tenê ya caw (qimaş) vekin ku gel ji gel me cawên xwe bigre, lê ew jî nebû. Piştî demek şûnde Desteya Çandê alîkariya me kir, bi saya wê me Kargeha Lîlît mezin kir."

**'10 jin di kargehê de dixebitin'**



Nûrhan Abdullah, di dawiya axaftina xwe de diyar kir wê dest bi projeyek nû bikin û dikanek parçeyên caw lê bifroşin û wiha got: "Di kargehê de em 10 jin kar dikin, 5 ji me karê dirûtinê û 5 jin ji karên destan çêdikin. Em li vir cil û bergên çanda Kurdî, kiras, qemîs û cilên ku em çêdikin û didin dikanên li bazarê karê dirûtinê. Me projeyek daye pêşiya xwe ku em perçeyên caw ji derve bînin. Ez gelek jinan dibînim ku karê wan xweş e lê kar nakin, ez bang li hemû jina dikim bila heza xwe kar bînin ku jêhatîbûna xwe derxin holê."

# Germbûna kurewî: Li gorî NY'ê gerstêrk li ber hilweşînê ye

Li gorî rapora nû ya Neteweyên Yekbûyî (NY), Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê (WMO), sala 2023'yan bûye deh salên herî germ ên tomarkirî.

Li gorî raporê di asta gaza serayê, germahiya rû, asîtbûn, germahiya okyanûsan, bilindbûna asta deryayê, mezinbûna girseya qeşaya Antarktîkê û paşvekişîna cemedan de rekor hatine şikandin.

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres hişyarî da ku gerstêrk "li ber hilweşînê ye" ji ber ku "germbûna sotemeniya fosîl dibe sedema kaosek avhewayê ya bêhempa".

Sekreterê NY'ê wiha hişyarî da: "Her dereceyek germbûna gerdûnî bandorek li ser pêşeroja jiyana li ser rûyê erdê dike."

Sekretera Giştî ya WMO Celeste Saulo diyar kir ku krîza avhewayê pirsgirêka herî girîng a ku mirovahî pê re rû bi rû ye û zêdebûna pêlên germê, lehî, ziwabûn, şewata daristanan û bagerên tropîkal dibe sedema belengazî û kaosê.

Celeste Saulo got, "Meteorolojiya kurewî hişyariyê dide cîhanê: Em di hişyariya xetere ne."

Sala borî, hema hema sêyeka okyanûsên cîhanê ji pêlên germê bandor bûn. Tê pêşbînîkirin ku ji %90 okyanûsên cîhanê heta dawiya sala 2023'yan li ber pêlên germê bin.

Nîşaneyên wekî bilindbûna asta deryayê, paşvekişîna cemedan û windabûna qeşaya deryayê ya Antarktîkê gihîştine astên metirsîdariyê. WMO zêdebûna hilberîna enerjiyê ya nûjen hêvîdar dibîne, ji sala 2023'yan vir ve bi qasî ji sedî 50 zêde bûye.



# FERHENGA BIWÊJAN

**Ne roj li min roj e ne şev li min şev e:**
- Dema yek pir nexweş be hingê dibêje.

**Ne roja min roj e ne şeva min şev e:**
- Bi heman wateyê.

**Pişta min ketiye ber min:**
- Ba ketiye pişta min; ez bawî bûme; ez seqet bûme; ez êdî nikarim ti karî bikim.

**Ser xwe ve hat:**
- Tenduristiya wî baş bû.

**Ser tayekî maye:**
- Nexweşê li ber mirinê ye.

**Ser rayekî maye:**
- Bi heman wateyê.

**Xew nakeve çavê wî:**
- Pir nexweş e.

**LI SER VIR Û DEREWAN**

**Aşê xwe bi derewan digerîne:**
- Karê xwe bi derewan dike; derewên pir mezin dike; li ber çavan derewan dike.

**Bextê xwe xirab dike:**
- Bêbextiyan dike; derewan dike; şehdezoriyê dike; dizane lê rastiyê nabêje.

**Benê derewan kurt e:**
- Derew zû eşkere dibin.

**Bi ava zemzemê jî xwe bişû baweriya min pê nayê:**
- Mirovekî pir bêbext e; xayîn e; derewker e.

**Bi benê dînan danekeve bîran:**
- Li pey kesê nezan neçe; guhê xwe nede kesê nezan.

**Biçirîne, caw cawê te ye:**
- Tiştên tu dibêjî tev derew in.

Bi roj miriyan dişelîne, bi şev ji qurquroneka dêrî ditirse.
- Sêhrekiyan dike; derewan dike; bi zanebûn xwe wisa nîşan dide; metrebaz e.

**Çiqas mar fetlan bide xwe wê rast biçe kunê:**
- Çiqas tu derewan bikî jî di dawiyê de wê rastî derkeve; çiqas tu xapan bidî xwe, çiqas tu xwe bidî aliyekî, çiqas tu ji rastiyê birevî jî, di dawiyê de tuyê werî ser riya rast.

**Çiv dan xwe:**
- Rast negot; di derdora mijarê re çû hat.

**Derew li miriyan tên kirin:**
- Tu derewan dikî; tu bêbextiyan dikî; ez sax im li cem te me tu derewan li min dikî.

Derewên wî bibask in;
- Hosteyê derewan e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi Kamere Birûc Resûl



# 'Em serkeftinê ji gelê xwe û namzetên demokratîk re dixwazin'



Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bang li gelê Bakurê Kurdistanê kir ku bi xurtî beşdarî hilbijartinên 31'ê Adarê bibin û got: "Dengê xwe bidin namzetên gel, divê AKP-MHP dengekî jî neştînin."**R-3**

# Qazî Mihemed; rêzan û xizmetkarê gel û welat

Komara Mehabadê di 22`ê Çileya sala 1946`an de ji aliyê Qazî Mihemed ve hatiye ragihandin û Qazî Mihemed wek serokomar hat hilbijartin. Herçend temenê Komara Mehabadê kin be jî, Mehabad di vê demê de bû navenda siyaset û rewşenbîriyê.**R-6**





# Jin û xweza nirxên jiyanê ne

Di destpêka mirovahiyê de jin bi her awayî jîndewerên jiyanê ye û nirxên sereke yên jiyanê jin û xwezaye, lewra moderniteya kapîtalîst xwest jin û xweza talan û qir bikin. Endama Platforma Jinên Ekolojîk Bêrîvan Omer diyar kir ku li hemberî vê qirkirinê têkoşîna jinê tê meşandin û got; jin li derdora xwe xwezayê geş dike.**R-2**

# Dengê berxwedan û serhildanê: Hozan Dilgeş



"Li Mêrdînê li Bagokê" û "Axa me zêr û zengîn e" ev awaz di salên 1980 û 1990'î de li kolanên bajêr û navçeyên Kurdistanê olan didan. Gava Hozan Dilgeş 12'ê Adara 2017'an ji nava me koç kir, wî li pey xwe 11 albûm û bi sedan awaz hiştin.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1156 · 31-Adar- 2024 · www.ronahi.net/ku/

# MED TV BÛ ÇAVKANIYA XWEGIHANDINA RASTIYÊ

MED TV yekemîn televizyona kurdî ya satelîtê bû, di 15'ê Gulana 1995'an de dest bi weşana xwe kir. Di vê pêvajoya dîrokî de Kurdistan her di bin dagirkeriyê de bû û kurd her di nav têkoşîna neteweyî de bûn. Zimanê wan qedexe bû, navê welatê wan tinebû, serok û pêşengên wan yan li zindanan, yan li çiyayan, yan jî li derveyî bûn. Yekem weşangeriya televizyona satelîtî ya Kurdan jî bi vî awayî li dûrî welêt, li Belçîkayê dest pê kir.**R-5**




# Xerîb Hiso:Newroza 2024'an ji dijmin û dagirkeran re bû bersiv



Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk(TEV-DEM) Xerîb Hiso diyar kir ku ji bo serkeftina doza gelê kurd û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo Newroza sala 2024'an xwedî girîngiyeke taybet bû û wiha got: "Gelê kurd karîn bi îrade û sekna xwe roja Newrozê bi hemû cîhanê bidin qebûlkirin."**R-4**

Jin û emeliyatên estetîkê — Zozan Cızîrî — R-2
Mizgîniya Tevgera Azadiyê Misogeriya Pêşeroja Birûmet e — Idrîs Henan — R-5
Êş û Jan — Sîpan Şînda — R-7

# Jin û xweza nirxên jiyanê ne

Di destpêka mirovahiyê de jin bi her awayî jîndewerên jiyanê ye û nirxên sereke yên jiyanê jin û xwezaye, lewra moderníteya kapîtalîst xwest jin û xweza talan û qir bikin. Endama Platforma Jinên Ekolojîk Bêrîvan Omer diyar kir ku li hemberî vê qirkirinê têkoşîna jinê tê meşandin û got; jin li derdora xwe xwezayê geş dike.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di destpêka mirovahiyê de jin bi her awayî jîndewerên jiyanê bû û ev berbiçav bû, ta ku mêrên fenek zanebûna jinê jê dizî û kire para xwe. Bi awayekî ew jiyana jîndewer kire dojeheke ku ji moderníteya kapîtalîst pêk tê. Mêr xwe weke zordestê xweza û jinê dibîne, talan û bindestkirina jin û xweza li ser xwe ferz dibîne, lê ne sîstemên kapîtalîst ne jî mêrê serdest ekolojî û jinê ji hev vedqetîne. Talankirina xwezayê talankirina jinê ye, talankirina jinê talankirina xwezayê ye di heman demê de. Yanî pirsgirêkên ekolojîk bi temamî ji mafê xwe dîtina mêr ve destpê dike, ev bi xwe re alûziya civakê û krîza ekolojiyê derdixîne holê, zêdebûna tundiya li ser jinê an kuştina wê ji vê derdikeve holê.



### Jiyan û azadî wê bi rengê jinê şîn bibe

Yekbûna jin û jiyan ku çavkaniya sereke ya azadiyê ye, eger ne li gorî zanistiya ekolojîk be, ne ayidê jinê û ne aydê civakê ye. Jin û jiyan encex li gorî pîvanên civaka ekolojîk dikarin bi awayekî rast hevdû temam bikin, hevsengiyê çêbikin. Ji bo jiyaneke ekolojîk jî berî her tiştî divê jin bi cewherê xwe dest bide jiyanê û xwedî li xwezayê derbikeve, wê demê jiyan û azadî wê bi rengê jinê şîn bibe. Qûtbûna di navbera mirov û xwezayê de, bi hezarên salan bi desthilatdariya li ser jinê hat dest pê kirin, lê ev yek wê bi têkoşîna ekolojîk a jinê ji holê rabe.

### Desthilatdar bi zihniyetên xwe jin û xwezayê qir dikin

Ji dîrokê ve heya niha mêtingeriya li ser jinan û pê ve girêdayî mêtingeriya li ser xwezayê di heman wextê de dest pê kir. Lewre dema em li roja me ya îro dinêrin, dibînin ku bi polîtîkayên qirkirina xwezayê re êrîşek mezin li ser jinan jî heye. Jin zêde nêzî xwezayê bûn, hevsengiya wê diparastin û gelek afirîneriyên wê bi zanista xwe keşif kir. Civaka xwezayî bi rêvebirina jinan tendurist bû, destdirêjiyên ewqas qirêj li ser ekolojiyê tunebûn. Lê dema ku rêvebirina civakê bi sedema sîsteman ji destên jinan derket. Êdî jê û şûn de sîstemeke desthilatdar derket holê û zîhniyetek li dijî jin û xwezayê bi pêş ket. Pê re jî şerê berjewendiyan derket pêş bê çawa sîstemê xweza ji bo bikaranîna berjewendiyan dixist xizmeta xwe, piştî ku ew civaka xwezayî ji bo jiyanê her berhemdar bû.

### Jin û xweza nirxên jiyanê ne

Nirxên sereke yên jiyanê xweza, jin, ked û azadî ye. Ji ber vê yekê pergala serdestiya mêr her tim êrîşî van kiriye û bi polîtîkayên dijminane dagirkeriya xwe berfireh kiriye. Ev her çar qadên mêtîngeriya pergalê, qadên bingehîn yên têkoşînê ne. Ji xwe di vê dagirkeriyê de hişmendî û rêbazên desthilatdariya zilam yê li dijî jinê û xwezayê bikar tîne jî yek in. Ev desthilatdarî weke jinê, xweza jî weke mal û milkê xwe dibîne. Hizirê mêr bi piştgiriya dewlet, ol û hiqûqê li ser civak, jin û xwezayê qirkirineke bê serûber dimeşîne û vê rewa nîşan dide.

### Şoreşa çandinê ya jinê berhemên bê hempa afirand

Keda ku fidayî axê û xwezayê hatibû kirin fidayî mirovahiyê jî hate kirin. Şoreşa çandiniyê ku bi ked û pêşengiya jinê pêş ket bi vî awayî xwe gihand hemû mirovahiyê û berhemên xwe yê bê hempa afirand. Ked tim bi axê re dostanî kir; berhemên wê pîroz dît, xwedî li wan derket, ev ji nû ve afirand û dewlemend kir. Lê dûrketina mirovan ji xwezayê hişt ku ked jî were firotin. Ji ber dagirkeriya kûr a pergala kapîtalîst êdî îro ked jî dijberî axê ye û xwezayê tine dike. Lê ji bo jiyaneke azad û ekolojîk, pêwîste ev xiyaneta kedê jî bi dawî bibe. Weke şoreşa çandiniyê jin îro jî divê xwedî li kedê derbikeve û dostaniya di navbera xweza û mirovan de ji nû ve ava bike.

### Bingehê jiyana xwezayî“jin e’

Her gava ku jin biavêje wê di jiyanê de encamên girîng bi xwe re bîne, herwiha bingehê jiyana xwezayî“jin e’. Têkoşîneke radîkal û alternatîf a di çarçoveya ekolojî, ked û azadiya jinê de were dayîn, dikare ji bo pirsgirêkên tevgerên ekolojîk ên weke marjînalbûn, elîtbûn, bi pergalê re sînordar mayîn û hwd… re jî çareseriyê Şaredariyên kantona Cizîrê û endama Platforma Jinên Ekolojîk Bêrîvan Omer ji rojnameya me re axivîn.

Bêrîvan Omer diyar kir ku jin li derdor xwe xweza geş kiriye û wiha got: “ Heger em li dîroka civaka xwezayî vegerin, em dibînin ku têkiliyeke hevseng di navbera jin û xwezayê de hebû. Her jin li derdora xwe xweza geş kiriye, cihê ku lê jiyan kiriye û maye çandinî li pêşxistiye. Heta niha jî girêdana jin bi xwezayê re ber-



bîne. Jixwe rewşa heyî jî vê bi her awayî ferz dike. Ji ber ku ev qirkirin hemû qadên jiyanê daye ber xwe. Ji bo têkoşîna ekolojîk îro jî pêwîstî bi tevgereke şoreşgerî heye û encex jin dikare pêşengiya vê bike. Yekbûna xweza û jinê ya li hemberî desthilatdariya zilam wê êniyên têkoşînê jî berfirehtir bike û bi her awayî hêz û piştgiriya jinan xurt bike.

### Divê hîmê têkoşîna ekolojîk pêş bikeve

Di sedsala 21’emîn de têkoşîna bi armanca şoreşa jinê tê meşandin û divê bi her awayî li ser hîmê têkoşîna ekolojîk pêş bikeve. Lewra herî zêde jin dikarin ji xwezayê fêhm bike, mafê xwezayê biparêzin û jê re bibin mertal. Tê zanîn ku heqîqeta gerdûnê jî di xwezayê de veşartiye. Jin çiqas bi vê heqîqatê re bibe yek wê ewqas pêş bikeve, serbikeve û xwe nêzî azadiyê bike û deriyê azadiyê ji mirovahiyê re jî veke. Divê bizanin ku heger xweza neyê parastin ne jiyan û ne jî civak tiştek nekare were parastin.

Derbarê girêdana jin bi xwezayê re Cîgira Hevserokatiya Yekîtiya dewame, ji ber jin xwezayê mîna zarokên xwe dibîne. Di dema niha de dibe ku cudahiyek di navbera jin û xwezayê de pêk hatibe, ew jî bandora hizirên kapîtalîzimê ye. Ji ber hizirên ku bi hezarên sala li ser jinê hat meşandin hişt ku jin û xweza ji hev dûr bikevin, lê çiqasî sîstema kaptalîzim hewil bide jinê ji xwezayê qut bike nikare, ji ber jin ya ku mala xwe şîn dike û bi xwezayê re bûye yek.”

### ‘Pêwîste ku xweşikbûna xwezayê were vegere’

Endama Platforma Jinên Ekolojîk Bêrîvan Omer axaftina xwe wiha bi dawîkir: “ Jin û xweza bi hev re hatin desteserkirin, ji ber dema ku jin hat kolekirin pêre xweza jî di heman de mê de hate talan kirin. Jin xweza diparast û lê hayil bû, lê dema ku mêr bû serdest, xweza talan kir, bi taybetî pêşketina pêşesaziyê bû sedema xerakirina derdorê. Hizirê desthilatdaran tenê berjewendiyên wan bû, xweza berbiçav negirtin. Lewra di cîhanê de gelek qeyranên ekolojîk derketin. Lê niha jin hewl dide ku xweşikbûna xwezayê vegerîne cewherê wê û zirara heyî ji holê rake.”

## Ramangeh

### JIN Û EMELIYATÊN ESTETÎKÊ

**Zozan Cizîrî**

Jinan di her pêvajoyeke dîrokê de girîngî dane aliyê hisin û cemalê. Ev taybetmendî wek parçeyeke xwezaya jinê ne pirsgirêk e, ne jî nîşaneke bêhêziyê ye. Berevajî nêrandineke li jiyan, civak û xwezayê ye. Ango jin ji ber girîngiya dane jiyanê her tim hewl Mixabin roja îro ji ber bandora propagandayên modernîst gelek jin ji vê taybetmendiya xwe ya xwezayî dûr ketine û ketine pey emeliyatên ciwankariyê. Bedena jin ku bi xwe çavkaniyeke xweşikbûn û bedewiyê ye, tê dîtin herî zêde jin berê xwe didin navendên ciwankariyê, rojane li ber deriyê dermanên sînaî yên sîstemê pere dirijînin, bêy ku bizanin derî li nexweşiyên derûnî û fizîkî vedikin. Bi ser de ger em behsa bedewiya fikrî û ruhî bikin, nakokiyek cidî bi navê dûrketina ji xweza û xweşikbûna jin derdikeve pêşberê me.

Tê dîtin li gor cinsê zilam bêhtirê xwe jin serî li emeliyatên difna xwe biçûk bikin, hinarkê rûyê xwe tijî bikin, zikê xwe biçûk bikin û hwd. didin. Jixwe dema temen dibe 40 salî, êdî pirsgirêka qermîçokan tam dibe nexweşiyeke derûnî. Vê carê ne emeliyatên estetîkê, ne jî dermanên ciwankariyê têrê nakin. Bandora vê derûniyê welê dike ku gelek jin xwe kirêt, kêm û nexweş bibînin. Lewre dema yek jê re beje “tu xweşik î” rûyê wê geş dibe, dema bêje “çima ev dera te qermiçî ye” cîhana wê ya navxweyî hildiweşe, paşê welê dibe ku hinek ji ber eynê ranabin. Li pey vê lêgerîn û hewldana bedewiya şiklî-sînaî êdî girîngiya pêşketina fikrî û felsefî li dawiyê dimîne. Ev jî wek kiryareke hişmendiya modernîst a mirov ji aliyê wateyî û zanistî dûr dixe, dike civakek mezaxker a hundirê xwe pûç û vala derdikeve holê.

Tam jî di vê xalê de ji bo jin li cewherê xwe vegere û nebe pêlîstikeke sîstema yekdestdar a zilam prensîbên Bîrdoziya Azadiya Jin ku Rêberê Konfederalîzma Demokratîk Rêber APO 8’ê Adara 1998’ê eşkere kiribû, girîngî û derbasdariya xwe ya ji bo roja îro bi me dide hesîn. Wekî Rêber APO destnîşan kirî, yek ji pênc prensîbên Bîrdoziya Azadiya Jinê prensîba etîk û estetîkê ye. Şaristaniya serdest a zilam û kapîtalîst pîvanên bedewbûnê bi awayê ku bedena jin ji fikir, hest û ruh veqetîne pêş dixe. Ev prensîb hewl dide ferd û hebûnên kolektîf ên bi azadî, rêxistinî, têkoşîn û xweseriyê hatine afirandin biparêze. Li gor vê prensîbê bedewiya ruhî, fikrî û hestiyarî yekpare ye. Azadiya fikir û ruh a bi ked û hewldanê tê bidestxistin, însan bi tevahî spehî dike. Ji bo mirov jiyanê jî xweşik û bi estetîk bike, pêwîste xwe ji her cureyê têkiliyên serdest-bindest, kirêtî û qirêjiyên dagirkerî û desteserkirinê afirandine pak bike. Wek tecrûbeyek li ber çavan tê dîtin ku, jinek di warê cism de çiqas xweşik xuya bike jî, lê gava nekaribe bi du gotinên watedar hest û nêrînên xwe îfade bike, tu qîmeteke wê xweşikbûna cismî namîne. Jineke bi fikra ezezî tenê li ber bejn û bala xwe bikeve, lê tu girîngiyê nede xweşikbûna jiyanê û xwezayê pir cihê xwe nabîne, heta tenê wek jineke ji rêzê tê dîtin. Lewre her jinek ji bo di nav çerxên sîstemê de nehele şert e bizane xweşikbûna esasî, xweşikbûna fikrî û ruhî ye, zerafet û ziraviya jiyanî ye.



# Dengê berxwedan û serhildanê: Hozan Dilgeş

“Li Mêrdînê li Bagokê” û “Axa me zêr û zengîn e” ev awaz di salên 1980 û 1990’î de li kolanên bajêr û navçeyên Kurdistanê olan didan. Gava Hozan Dilgeş 12’ê Adara 2017’an ji nava me koç kir, wî li pey xwe 11 albûm û bi sedan awaz hiştin.

Her gelek bi navdarên xwe tên naskirin û dîroka gelan bi pêşengiya van navdaran tê nivîsandin. Ji berê heta roja îro dengbêj û hozanan bi klameyên xwe yên herî giran biha, êş, hesret, evîn û têkoşîna gelê xwe û xwe vegotine. Hozan Dilgeş jî yek ji van hozana ne. Hunermendê Kurd ê Êzidî Hozan Dilgeş çendîn weke hozanekî mezin yê “Dengê berxwedan û serhildanê” were nasîn jî, li hêla din wî bi stranên xwe bingehê stranên şoreşê jî daniye û di vî warî de pêşengiyeke biqedir bilind kiriye.

Hozan Dilgeş sala 1952’yan li gundê Fisqînê yê ser bi Nisêbînê hat dinê. Ji 12 xwişk û birayan bû. Çava ku li gorî baweriya Êzîdîtiyê tembûr pîroz e, bavê wî dersa tembûrê dide wî. Di 12 saliya xwe de fere lêxistina tembûrê dibe. 14 salî êdî ew di çalakiyên cihî de derdikeve ser dikê.



### Ji Kurdistanê koç dike

Rewşa siyasî ya salên 1970’yî bandor lê kir û ew li Nisêbîn, Şirnex, Colemêrg, Wan, Wêranşar, Dêrik û Şemrexê beşdarî çalakiyan bû; vê jî gelek bandor li wî kir. Hozan Dilgeş albûma xwe ya yekemin di sala 1978’an de bi navê “Ma qey bindestî para me ye” derxist. Di albûma xwe de ew dibêje, girî û nalîn ne çare ye û tenê rêya berxwedanê li ber Kurdan heye. Piştî vê albûmê di heman salê de neçar dimîne, ji welat dûr bikeve û berê xwe dide Elmanyayê.

### Cihê xwe di koma berxwedan de girt

Hozan Dilgeş sala 1983’yan beşdarî çalakiyeke Hunerkomê dibe. Piştî vê çalakiyê ew di Koma Berxwedan a ser bi Hunerkomê de cihê xwe digire. Ji bilî vê ew li seranserê Ewropayê tevlî çalakiyan bû û derket ser dikê. Di 40 salên xwe yên hunerê de wî 11 albûm derxistin. Evîna Kurdistanê ya di dilê wî de her tim jê re bû kaniya stranan.

### Li Mêrdînê li Bagokê

Wî berxwedana li Kurdistanê timî di stranên xwe de îfade dikir. Yek ji van stranan “Li Mêrdînê li Bagokê” bû ku ev strana berxwedanê di roja me ya îro de jî li ser ziman e. Wî ji bo vê stranê gotibû, “Strana ‘Li Mêrdînê li Bagokê’ ne ya min e. Leheng û qehremanan ew çêkir. Keç û xortên Kurdan ev stran û berhemên wekê wê bi xwîna xwe çêkirin. Min tenê ew gotin, a heyî min gihand siberojê.”

### Berxwedana Bagokê

Cihê herî bilind ê Çiyayê Bagokê hezar û 210 metreyî bilind e. Ev çiya di navbera Nisêbîn û Mîdyadê de ye û digihêje heta bi Hezexê. Ji ber ku sê herêmên sînor e ku Kurdistan pê hatiye parçekirin, ji aliyê stratejîk ve girîng e. Dema ku mirov ji serê Bagokê li dora xwe binihêre dikare bi hêsanî Keleha Mêrdînê, ronahiyên Nisêbîn-Qamişloyê û girên Şengalê bibîne. Bagok di salên 1980’î de bû yek ji baregehên gerîlayên Kurdistanê. Roja 1’ê Nîsana 1988’an komek gerîlayên ARGK’ê li dijî zêdeyî 10 hezar leşkerên Tirk berxwedaneke dîrokî kir. Şerê Bagokê rojekê û şevekê dewam kir. Vê berxwedanê rûpelekî nû li têkoşîna gerîla zêde kir. Piştî şer, medya Tirk tenê ragihand ku serdarekî pîlot û du leşker hatine kuştin, windahiyên din ên artêşa Tirk veşartin. Lê belê ev berxwedana gerîla ewqasî mezin bû ku dewleta Tirk nekarî veşêre û li Botan û Mêrdînê deng veda. Li gorî bîlançoya ARGK’ê nêzî 200 leşkerên Tirk di vî şerî de hatin kuştin. Gerîlayan ligel derfetên xwe yên kêm jî helîkopterek xist xwarê. Ew şerê gerîla yê herî mezin yê heta hingê bû.

Berxwedana Bagokê bi strana “Li Mêrdînê li Bagokê” ya Hozan Dilgeş di hişê mirovan de ma.

**“Li Mêrdînê li Bagokê**
**Xwîn herikî wekî cihokê**
**Li Mêrdînê li Bagokê**
**Xwîn herikî wekî cihokê**
**Şer dewam kir şev û rokê**
**Şer dewam kir şev û rokê**
**Bijî şerê me li Bagokê**
**Bijî şerê me li Bagokê**
**Çiyayê Bagokê bi dar e**
**Leşker hat ser bi hezar e**
**Çiyayê Bagokê bi dar e**
**Leşker hat ser bi hezar e**
**Li wir bûbû axir dewran**
**Li wir bûbû axir dewran**
**Li ser serê çend hevalan**
**Li ser serê çend hevalan**
**Çav ji dijmin neşikandin**
**Şer xweş kirin kemilandin**
**Çiyayê Bagokê hejandin**
**Çiyayê Bagokê hejandin**
**Dîrok bi zêr neqişandin**
**Dîrok bi zêr neqişandin**
**Têkoşer û wan serdaran**
**Sê firokên anîn xwarê**
**Kuştin dijmin bi qedara**
**Kuştin dijmin bi qedara**
**Kuro nayê ji Kurda re**
**Kuro nayê ji me Kurda re**
**Çiyayê Bagokê bi nav e**
**Xwîn lê herikî wekî av e**
**Çiyayê Bagokê bi nav e**
**Xwîn lê herikî wekî av e**
**Bijî bijî ey partîzan**
**Bijî bijîn ey partîzan**
**Wan şehîdan sed silav e**
**Wan şehîdan sed silav e**
**Heval Delîl bûbû rêber**
**Xwişka Ayten êrîş bir ser**
**Heval Delîl bûbû rêber**
**Xwişka Ayten êrîş bir ser**
**Çardeh mişûdê wan hene**
**Çardeh mişûdê wan hene**
**Ewan kuştin gelek leşker**
**Ewan kuştin gelek leşker**
**Li Mêrdînê li Bagokê**
**Xwîn herikî wekî cihokê**
**Şer dewam kir şev û rokê**
**Şer dewam kir şev û rokê**
**Bijî bijî şerê me li Bagokê**
**Bijî şerê me li Bagokê”**

### Ruhê demê

Hozan Dilgeş muzîka xwe weke dengê berxwedan û serhildanê ji bo xelkê dan pênasekirin. Gava got, “Ma qey bindestî para me ye lo” li dijî sîstema heyî serî hildida; gava digot, “De lêxin, lêxin birano lêxin, xayînê mezin axa û şêx in” mêtingeriya şêx û axayan kire hedef. Bi “Karkero Piroletero” bang li karkeran dikir; bi “Serî dan û sir nedan” bûbû dengê berxwedana zindanan. Bi “Mixtaro” hevkarên dijmin mehkûm dikirin; bi “Biçûkê canê” zarokên di şeran de tên kuştin kiribûn rojev. Bi “Çuş çuş Xumeynî” dev avêtibû paşverûtiyê; bi “Çira find û fenerî” behsa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kiribû. Hozan Dilgeş bi “Menal şehîdê mino” şîna şehîdan girêda; bi “Bijî bijî ARGK” silav da artêşbûna Kurdan.

### Sînor ji holê rakir

Hozan Dilgeş piştî ku bi nexweşiya pençeşêrê ket û her du lingên wî hatin jêkirin jî wî hewl dida ku awazên Kurdî çêbike û dixwest li ser berxwedana Kobanê û Şengalê albûmekê derbixe. Mixabin ku temenê wî têrê nekir. Hozan Dilgeş bi muzîka xwe sînorên ji bo Kurdistanê hatibûn xêzkirin ji holê radikir û hemû parçeyên Kurdistanê digihand hevûdu. Muzîka Hozan Dilgeş muzîka berxwedan û raperînê bû. Serîrakirina li hemberî zext û zilman di navenda muzîka wî de cih digire. Wêrek bû û wêrekiyê dida hezkiriyên xwe. Hozan Dilgeş di 12’ê Adara 2017’an de xatirê xwe ji gelê Kurd û hezkiriyên xwe xwest û koça dawî kir.

### 11 albûm û bi sedan stran li pey xwe hiştin

Hozan Dilgeş, gava ku ji nava me koç kir, 11 albûmên xwe û di gelek albûmên Koma Berxwedan de birek stran û klam hiştin. 7 sal bi ser wefata hunermendê Kurd ê navdar Hozan Dilgeş re derbas bû. Hozan Dilgeş di serdemek gelek zehmet de, bi hunera xwe têkoşînek mezin daye, berxwedan, serhildan, êş û zehmetiya gelê Kurd bi stranan vegotiye. Ji bo wê çendê ye ku piştî 7 salan hîna jî dengê wî di dilê gelê Kurd de zindî ye.

Nav û salên albûmên wî wiha ne:
1978: “Ma qey bindestî para me ye”

**1980: “De lêxin, lêxin birano lêxin, xayînê mezin axa û şêx in”**
**1981: “Newroz e, Newroza cejna gelê me”**
**1983: “Karkero Piroletero”**
**1986: “Serî dan û sir nedan”**
**1989: “Muxtaro”**
**1990: “Biçûkê canê”**
**2001: “Ez û Yar”**
**“Gola Wanê”**
**“Heval Mazlûm”**
**“Pale”**



### Êş û Jan

**Sîpan Şînda**

Jiyan du alî ye. Alîyek yê jiyanê xweşî û alîyê din jî nexweşî ye. Xweşî çi qeder rastiya jiyanê ye, nexweşî jî ewqas rastiya jiyanê ye. Jiyan ne bê êş dibe ne jî bê xweşî dibe.

Dema behsa nexweşîyê tê kirin, mirov vediciniqin. Ji ber ku hêza wê xurte û mirovan diêşîne. Ango di bingeh û rastîya nexweşîyê de êş û jan heye. Ji ber ku mirov ji êş û janê hez nakine û ew nikarine zêde xwe li ber bigirine; lewra ew ji wê direvine. Gelo êş tiştek çawa ye û çi di hundirê xwe de dihewîne? Êş, rastîyê di hundirê xwe de dihewîne û ew rastîya mirovan derdixe holê. Rastîya ku êş derdixe holê, rastîya heqîqî ye û ne weke ya xweşî derdixe holê ye. Rastîya xweşîyê, ya sere sere ye û ew ne qayîm e. Lê rastîya ku nexweşî derdixe holê, janê di hundirê xwe de dihewîne û ew ji mirovan di bin ezmûneke rastî re derbas dike. Ji ber ku êş, rayên xwe berdide di nava kûrahiyên dilê û giyanê mirovî de, ew dil û giyanê mirovî dide li ber xinceran, şûran, guleyan. Gurzên ji yên Rostemê Zal girantir li dil û hinavê mirovî diwerîne. Weke danê di conî de, çawa dema mîrkut lê dikeve û qalikê wî danî ji ser dibe û dike pap û danî tazî dihêle, jan jî eyn welê ye; dema ew dikeve di nava dil û giyanê insanî de, esaleta mirovî derdixe holê. Lê ya girîng ew e ku mirov bizanibe ka mirov çi qeder dikare xwe li ber êşê bigire û çawa dikare ji şewqa wê de bê der.

Dema jan dikeve di nava dil û giyanê mirovî, ew mirovî diguvêşe û gelek mirovan jî ji bayê xwe têxe. Li gorî giraniya janê, ew mirovan ji darê dinyayê dike û dinyayê li ber çavên wan reş dike. Cureyên êşê hene ku yek ji wan êşên herî giran jê êşa dil e. Jana ku dikeve di nava dil de, yek ji êş û janên herî giranin ji bo mirovî. Kula dilî, kulekî bê hempa ye û ew yek ji janên ku herî zêde mirovî têşîne ye. Lê ew rastiya mirovî jî datîne li ber çavên mirovî. Ka mirov çi qeder xwedî vîn û bawerî ye û mirov çi qeder dikare li vîna xwe xwedî derbikeve. Ew jana ku êrîşî dilê mirovî dike, dilê mirovî misqal bi misqal, dîrhem bi dîrhem hişk dike. Ew kezeba mirovî dişewitîne, dil û hinavê mirovî dide li ber daxan, lê dilopeke xwîn jî jê nayê. Êşeka din ya herî giran jî êşa kezebê ye ku mirovî li ser rûyê dinyayê ji her tiştî qayîmtir dike. Li gorî kesên ku êşa kezebê dîtine, ew naşibe tu tişteke din. Yan ji tu tişt, tu êş û jan nîne ku bişibe êş û jana wê. Ew ewqasî girane û bandora wê ewqasî zêde ye, giyan, dil û mejîyê mirovî têk dibe. Bê goman ew rastîya xwerî ye ji bo mirovî û çi rastîyên din li ser wê re nîne. Heke mirov ne serwext be, ev êş dikare him ji aliyê derûnî ve û him jî ji aliyê fîzîkî ve xisareke mezin ji bide mirovî. Ya rast ev herdû cureyên êşê jî mirovî di halê xwe de dihelîne û mirovî ji wî halî dibe haleke din.

Belê, divê mirov ji ber rastîyên jiyanê nereve û xwe nede alîkê. Êş û jan çi qeder giran dibin bila bibin, cewherê mirovî dikare wan sivik bike yan jî rê bide ku mirov di nav wan êş û janan de bixeniqe.

# Qazî Mihemed; rêzan û xizmetkarê gel û welat

Komara Mehabadê di 22`ê Çileya sala 1946`an de ji aliyê Qazî Mihemed ve hatiye ragihandin û Qazî Mihemed wek serokomar hat hilbijartin. Herçend temenê Komara Mehabadê kin be jî, Mehabad di vê demê de bû navenda siyaset û rewşenbiriyê.

**Hêvî Melek/Qamişlo**

Komara Kurdistanê ya Mehabadê di 22'ê Çileya sala 1946'an de li Meydana Çarçira ji aliyê Qazî Mihemed ve hate ragihandin. Piştî hikûmeta Başûrê Kurdistanê ku Şêx Mehmûd Berzencî li Silêmaniyê hat îlankirin, Komara Kurdistanê ya Mehabadê, di warê dewletbûyinê de, ji bo kurdan tecrûbeyek bû. Lê belê hin welat ji bo berjewendiyên xwe, Komara Mehabadê feda kirin. Komara Mehabadê ku tenê 11 mehan dewam kir, di dema rêveberiya xwe de di warê sazîbûnê de serkeftinek mezin bi dest xistin. Hinek ji van destkeftinên bingehîn artêşê yên nûjen ên girêdayî Komarê, avakirina rêxistinên îdarî û rêveberî, avakirina dadgehan, berhevkirina bac, avakirina xezîneyan, çareserkirina pirsgirêkên tenduristî û perwerdeyê bûn. Komara Mehabadê, her çiqas heta demek kin berdewam kir jî di wê demê de, bû navenda siyaset û ronahiyê.



**Komara Mehabadê bû navenda siyaset û rewşenbîriyê**

Komara ku li Mehabadê hate sazkirin, ala netewî ya Kurdistanê hat bilind kirin. Herwiha rêxistinên aborî, civakî, edebî, hunerî û rêxistinên leşkerî jî hatin sazkirin. Rojname û kovar derketin. sîstema Rêvebir ya Komarê jî hate sazkirin. Zimanê kurdî bi fermî hate qebulkirin. Şanoya kurd hate sazkirin. Ji bo jin di aliyê siyasî û civakî de pêşbikevin, di 14'ê Adarê de, Yekîtiya Jinên Kurdistanê hate sazkirin. Hevjîna Qazî Mihemed, Mine Xanim, di xebatên jinan de, roleke mezin lîstiye. Herwiha hewl hate dayîn ku têkiliyên diplomasî jî werin xurtkirin. Bi kurtahî herçend temenê Komara Mehabadê kin be jî, Mehabad di vê demê de bû navenda siyaset û rewşenbiriyê. di sala 1945`an de Komale belav bû, piştî belavbûnê bi pêşengiya Qazî Mihemed Partiya Demokratîk a Kurdistana Îranê hate avakirin. Di bernameya partiyê de ji bo kurdan xweserî, bi zimanê dayikê perwerdehî, fermîbûna zimanê kurdî te qebulkirin.

**Bernameya komara Mehabadê:**

-Kurd dê serbixwe bin di nava xaka Îranê de, di kar û xebatên xwe yên herêmên kurdan de dê serbixwe bin
-Ji bo karên rêvebirinê dê kurdî were serbest kirin û di kar û xebatan de kurdî dê were bikaranîn
-Rêvebirên dewletê yên li vê derê dê ji nav xelkê deverê were hilbijartin
-Bi lezgînî endamên Konseya Deverî ya Kurdistanê bi çûna zagonên hilbijartinê dê werin hilbijartin ku kar û xebatên deverê bikin
-Bi zagoneke giştî, pirsgirêkên di navbera xwediyên erdan û rênçberan de dê werin çareser kirin û ji bo paşerojê rolên wan bên aşkera kirin
-Partiya Demokratîk ya Kurdistana Îranê kedeke taybet xerc bike ku biratî yekbûnê di navbera gelê Azerbaycanê û gelên din yê Azerbaycanê (asûrî,ermenî, hwd) de pêk bîne.
-Partiya Demokratîk ya Kurdistana Îranê dê bixebite ku aramiyê ji bo xelkê Kurdistanê pêk bîne
-Gelên di Îranê de dijîn dê ji bo azadiya xwe û aramiya xwe bi hev re bixebitin.

Artêşa Komara Kurdistan ji du beşa pêk tê. Beşa Yekem leşkerên perderweyî ne, hejmara wan 3 hezar Pêşmerge bûn. Beşa duyem ji leşkerên eşîran pêk dihatin ku hejmara wan nêzî 15 hezar kesan bû. Perwerdeya van pêşmergeyan di salên 1940`î de ji aliyê leşkerên peyabilind yên ji Artêşa Îraqê veqetîn re dihate dayîn. Peyva Pêşmerge yekemîn car di artêşa Komara Kurdistan de tê bikaranîn.

**Aboriya Komara Mihabadê**

Aboriya Komara Mihebadê li ser bac û şirketa Terakkî ve birêve diçû. Di nav bajarên girêdayî Kurdistanê ve bac dihatin standin. Ji bo bac standinê du komîsyon hatibûn ava kirin. Komîsyonekê li navendên bajaran ji bazirganan bac digirtin, komîsyona din jî li gundewaran ji xwediyên erdan bac digirtin. Piştî rûxandina Komara Azerbaycanê ji aliyê dewleta Îranê ve bi awayeke xirab, di nav Komara Kurdistanê de jî tirs çêbû. Qazî Mihemed biryara radestkirina xwe da. Ji ber ku nedixwast ew hovîtiyên li Azerbaycanê çêbû li Kurdistanê jî çêbibe. Soz da gelê xwe ku heta dawiyê wê li Mahabadê bimîne ku zerar negihîje li Kurdistanê dê bixebite.

**Dema têkçûna Komara Mehabad**

Her wisa gelek eşîrên piştgirî didan Komarê ji komarê veqetiyan. Piştî ku hate zanîn Kurdistan nikare xwe li dijî dewleta Îranê biparêze; Serokomarê Kurdistanê li Miyandûabê hat girtin û biryara darvekirina wî hat. Berî ku bê darvekirin axaftineke xwe ya dawî got û axaftina wî wiha bû: ''Hûn niha Qazî Mihemed dikûjin, Lê sibê dê ji her dilopeke xwîna min gelek Qazî Mihemed rabin û di vê riyê de bimeşin''. Qazî Mihemed, Wezîrê Parastinê Seyf Qazî û birayê wî Ebdulqasim Qazî ku nûnerê Mahabadê bûn di parlamena Îranê de, li meydana Çarçirayê di 31`ê Adara 1947`an de hatin darvekirin. Gelek rêveber û berpirsiyarên Komara Kurdistanê hatin darvekirin an jî hatin zindanîkirin. Hêjayî gotinê ye ku piştî van darvekirinan li hurremabada a girêdayî Loristanê li dijî van darvekirinan nerazîbûnên mezin di sala 1947`an de hatin nîşandan.

# ‘Meha Remezanê hezkirin û hevgirtinê di nava gel de xurtir dike’

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

**Kordînasyona Meclisa Jin a Kongra Civaka Islamî Meha Izo diyar kir ku meha remezanê yek ji stûnên Îslamê ye, herwiha meheke pîroze ji ber ku Quran tê de hatiye daxistin,herwiha mirov tê de li xwe vedigerin, xêra dikin û têkiliyên hezkirinê zêdetir dike.**

Li tevahiya welatên misulmanan, meha remezanê xwedî girîngiyeke mezine û misulman di vê mehê de rojiyê digrin û rê û rêsmên wê pêk tînin. Li bakur û Rojhilatê Sûriyê jî meha remezanê bi kefxweşî tê pêşwazîkirin.
Derbarê vê mijarê Kordînasyona Meclisa Jin a Kongreya Civaka Îsamlî Emîra Izo ji rojnameya me re axivî.
Emîra Izo di destpêka gotinên xwe de meha remezanê li hemû gelan bi taybet li gelên bakur û rojhilatê



Sûiyeyê û cîhanê pîroz kir û wiha pê de çû: “Meha remezanê meheke ji stûnên Îslamê ye her wiha Quran tê de hatiye daketin ji ber vê yekê jî pîroz û mubareke. Meha remezanê ne tenê ji bo rawestandina av û vexwarnê ye lê belê ji bo ku her kes bi mirovên xizan û yên rewşên wan ne baş hîs bikin, alîkariya hev bê kirin hezkirin û hevgirtin zêdetir di nava gel de çêbibe.”

**’Komeleya Selam ji bo pêşkêşkirina alîkariyan dixebite’**

Emîra da zanîn ku ji bo pêşkêşkirina alîkariyên meha remezanê Komeleya Selam dixebte û wiha domand:”Komeleya Selam beşeke ji Kongreya Civaka Îslamî ye hevkariyê bi hev re dikin da ku alîkariyan pêşkêş bikin. Ji xwe kesên ku alîkarî li wan tê belavkirin ewin xelkên xizan, kesên bê dê û bav û  malbatên ku rewşa wan ne başin. Di heman demê de jî xwarinê ji xelkê re çêdike û li wan belav dike, selikên xwarinê pêşkêş dike.”
 Emîra Izo çşaret kir ku alîkarî ne tenê li Qamişlo tê belav kirin, li Hesekê jî tê dayîn û yên zêdetir li kampên penaberan tê dayîn.

**’Bernameyên têkildarî meha Remezanê tên pêşkêş kirin’**

Emîra destnîşan kir ku Kongreya Civaka Demokratîk weke xebatên dabû pêşiya xwe bernameya diyarkirina seatan ji destpêka rojiyê hazir kirbûn û wiha got: “Seatên azana sibehê û azana fitorê hatin diyarkirin bi hemû hûgrguliyên wê ku li ser rûpela kongreyê, li hemû saziyan û mecalisan li bakur û rojhilatê sûriyeyê hat belavkirin.”
Di berdewamiya gotinên Emîra Izo de hate destnîşan kirin ku kongreyê hemû hûrgûliyên zikatê fitrê û zikatê pera di riya tabloyek hatiye çêkirin tê de hemû pirsên zikatê hatiye diyar kirin.

**’Ji bo nimêj û xitbên Înê kongir mijaran diyar dike’**

Emîra Izo da xuyakirin ku ji bo xitbên înê kongir mijarên van xitbeyan li gorî rewşa heyî diyar dike û wiha dewam kir: “Xutbeyên Înê 10 rojên destpêkê behsa xêra van rojan, herwiha behsa xêra alîkariyan dikir. Di riya van xitbeyan hişmendiya gel pêş dixin di nava civakê de yanî bi awayekî giştî tê şîrovekirin.”

**’Bernamyên şîrovekirina hûrgûliyên meha Remezanê di riya raghandinê tên pêşkêş kirin’**

Emîra Izo derbarê bernameyên meha Remezanê jî wiha got: “Bernameyên şîrovekirina meha rojiyê, eleqeya rojiyê bi civakê re, fêrkirina nimêjê ji hêla endamên kongreyê li ser raghandinê di radyoyan an jî televîzyonê tên dayîn. Ji bo zelalkirina pirsên di nava mirov de çêdibe. Li gorî îslama rast dûrî îslama rast û ji ya radîkal dûr.”
Kordînasyona Meclisa Jin a Kongreya Civaka Îslamî di dawiya axaftinên xwe de anî ziman ku bi boneya hatina meha remzanê gelek pîrozbahî û serdan ji olên din hatin pêşkêşkirin ev yek dihêle ku hevgirtin û hezkirin di nava pêkhateyan xurttir bibe her wiha watya yekbûna gelan dide nîşandan.



# ‘Em serkeftinê ji gelê xwe û namzetên demokratîk re dixwazin’

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê bang li gelê Bakurê Kurdistanê kir ku bi  xurtî beşdarî hilbijartinên 31’ê Adarê bibin û got: “Dengê xwe bidin namzetên gel, divê AKP-MHP dengekî jî nestînin.”

**Navenda Nûçeyan**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê têkildarî Hilbijartinên Xwecihî yên 31’ê Adarê daxuyanî da û diyar kir ku divê AKP-MHP dengekî jî nestînin.
KCK’ê diyar kir ku ew siyaseta qada demokratîk weke qadeke girîng dibînin û wiha got: “Wek tê zanîn di 31’ê Adara 2024’an de li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê hilbijartinên xwecihî tên kirin. Gelê Bakurê Kurdistanê jî girîngiyê dide van hilbijartinan û dixwaze bi namzetên welatparêz, demokrat bikevin hilbijartinê. Em jî piştgiriya nêzîkatiya gelê Bakurê Kurdistanê dikin û dixwazin encamên serkeftî bi dest bixin. Em siyaseta demokratîk weke qadeke girîng dibînin. Qada siyaseta demokratîk encama têkoşîna gelê me ye. Di pêkhatina vê herêmê û berdewamkirina hebûna wê de heta îro bi hezaran şehîdên gelê me hene. Bi ked, têkoşîn û bedelan hat qezenckirin û parastin. Rêveberiyên xwecihî hêmana herî girîng a siyaseta demokratîk û demokrasiyê ne. Rêveberiyên herêmî yên demokratîk ji bo gelê me yê ji bo azadî û demokrasiyê têdikoşin xwedî girîngiyeke taybet e. Her wiha hem hilbijartinên giştî û hem jî yên xwecihî di warê eşkerekirina helwest û îradeya siyasî ya gelê Kurd de her tim cihekî girîng girtine. Gelê Kurd li dijî qirkirin û mêtingeriyê ji bo hebûn û azadiyê têdikoşe. Dewleta Tirk a dagirker bi dehan salan e ku dixwaze qada siyaseta demokratîk tasfiye bike û ji xeta xwe dûr bixe. Ji bo vê jî serî li zext, şantaj, sirgûn, girtin, komkujî û her cure pêkanînên dijmirovahî da. Jitem û Hizbulkontra bi hezaran kuştinên kiryar nediyar kirin û welatparêz hatin qetilkirin. Lê nekarî gelê Kurd û qada siyaseta demokratîk bi dest bixe. Qada siyaseta demokratîk li ber xwe daye û dev ji helwest û xeta xwe ya welatparêziya demokratîk bernedaye û tawîz nedaye. Em vê yekê pir girîng û bi nirx dibînin û li vir em hemû şehîdên demokrasiyê yên weke Vedat Aydin û Apê Mûsa careke din bi bîr tînin.”

**‘Gelê Me piştgiriyê dide DEM partî’**

KCK’ê di dewama daxuyaniya xwe de wiha got: “Em dibînin ku namzetên DEM Partiyê li Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê eleqe û kelecanek mezin çêdikin. DEM Partî bi helwest, bername û bernamzetên xwe li ku derê be, çi li Kurdistanê û çi jî li Tirkiyeyê bala gelê me dikşîne û piştgiriyê didinê. Piştî hilbijartinên giştî yên 14’ê Gulanê çûna ba gel û destpêkirina pêvajoya avakirina demokratîk encamên girîng derxist holê. Yek ji van encaman jî ew e ku namzet ji aliyê gel ve bi rêbaza pêşhilbijartinê hatin diyarkirin. Ev rêbazek pir rast û demokratîk bû û raya giştî jî ev nêzîkatî rast dît û piştgirî da. Sedemek eleqe û kelecana Kurdistanê jî ev e. Ji ber ku DEM Partî pergala hevserokatiyê esas digire û bi namzetên hevşaredariyê derketin pêşberî gel, ev jî hişt ku gelê me piştgiriyê bide wê. Helwesta zelal a gelê me li hemberî nêzîkatiyên şaş ên li hemberî hevşdaredarî û hevserokatiyê û xeta jina azad, ev rastî bi awayekî vekirî nîşan da.”

**‘Desthilatdariya AKP-MHP’ê li ser qirkirina Kurdan ava bû’**

KCK’ê destnîşan kir ku desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê zexta herî mezin li qada siyaseta demokratîk kiriye û wiha domand: “Desthilatdariya AKP-MHP’ê bi temamî li ser qirkirina Kurdan bû, di warê xerabiyê de her tişt kir. Zext, şantaj, gef, girtin, kuştin; heke ev nebin, bi rêbazên şerê taybet mirovan bixin, teslîm bigirin û hwd. her cure rêbazên qirêj bi kar anî. Tayînkirina qeyûman lûtkeya van xerabiyan e. Di çarçoveya polîtîkaya qirkirina Kurdan de qeyûm hatin pêşxistin. Desteserkirina vîna gelê Kurd, înkar û îmhaya hebûna wî ye. Tayyîp Erdogan û desthilatdariya AKP-MHP’ê bi tayînkirina qeyûman li bajarên Kurdistanê îspat kirin ku rêveberiya herî înkarker û dijminê herî mezin ê Kurdan e. Gelê me vê heqîqetê pir baş fêm dike û têdigihîje. Helwesta tund a ku di Newrozê de derket holê, îlana vê ye. Helwesta xurt a gelê me ya di Newrozê de dostan şed kiriye û dijminên me yên zalim û înkarker hêrs kir. Eşkere ye ku ev helwest wê di hilbijartinên xwecihî yên 31’ê Adarê de jî derkeve holê. Em du mijaran girîng dibînin û dixwazin balê bikşînin ser



wan. Ya yekem, ev hilbijartin teqez di rewşeke demokratîk de pêk nayên. Zextên li ser gel û saziyên demokratîk gihiştiye lûtkeyê. Hemû sazî û dezgehên dewletê giraniya xwe dane Kurdistanê, her cure hîle li gel hemû zextan tê kirin da ku namzetên DEM Partiyê bi ser nekevin. Bi sed hezaran leşker, polîs û karmend ji bo dengdanê anîn bajarên Kurdistanê û li vir hatin bicihkirin. Ji ber vê yekê bi zane ku hilbijartin di rewşeke wiha de tê kirin, ji bo pûçkirina komplo û hîleyan pêwîste mirov bi beşdariyeke xurttir biçin ser sindoqan. Divê AKP-MHP û hevkarên wan nikaribin yek deng jî ji gelê me bistînin. Divê tu kes nekeve nava dubendiyê û ji bilî namzetên gel dengê xwe nede kesekî din. Divê kesên wiha îqna bikin, dudilî nebe, hilbijartin bi yek dengî pêk were. Li aliyê din divê hem gel û hem jî yên berpirsyar in divê teqez deng û sindoqan biparêzin. AKP-MHP û hevkarên wê bi zext, sextekarî û komployan dixwazin rejîma qeyûmê yên şaredariyên Kurdistanê deseser kirine asayî bikin û rewa bikin. Divê gelê Bakurê Kurdistanê rê nede vê yekê.”

**‘Em serkeftinê ji gelê xwe û namzetên demokratîk re dixwazin’**

KCK’ê daxuiyaniya xwe wiha qedand: “Divê li hember hevkar, xiyanetkar û kom û kesayetên kujer ku xwe firotiye dijmin û li dû mal û milkê xwe ne, bersivek pir tund bê dayîn. Divê tu kurd bi kêfxweşî nêzîkî van xayinan nebe. Ev pêkhateyên ku hewl didin xwe weke Kurd nîşan bidin, destê wan ketine xwîna gelê me û ji bo ku têkoşîna azadiyê bi ser nekeve, keriyên kujer ên ku ji aliyê dewletê ve tên bikaranîn. Pir girîng e ku gelê me li hemberî van komên ku baş nas dike bi yekîtiyê tevbigerin û bersiva pêwîst bidin wan. Bi vê hest, hêvî û baweriyê em bang li gelê xwe dikin ku bi xurtî beşdarî hilbijartinên 31’ê Adarê bibin û serkeftinê ji gelê xwe û namzetên demokratîk re dixwazin.”

# Di Adarê de 35 kes li Efrîna dagirkirî hatin revandin

**Navenda Nûçeyan**

**Li Efrîna dagirkirî, ji 1 heta 27`ê Adarê 35 kes ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatine revandin.**




Ji despêka dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve, welatiyên Efrînê rojane bi revandin, guştin û işkencekirinê re rûbirû dimînin.
Li gorî nûçeya ajansa ANHA’yê ji 1 heta 27’ê Adarê li ser destê çeteyên dewleta Tirk 35 şênî li Efrîna dagirkirî hatine revandin.

**Dem, cih û navên şêniyên ku hatine revandin wiha ne:**

-1’ê Adarê çeteyên Artêşa Nîştimanî (polîsa sivîl) yên dewleta Tirk a dagirker li gundê Bîbaka yê navçeya Bilbilê 3 şêniyên bi navên; Ziyad Şeref (49), Ebdurehman Şeref (62) û Salan Dilo (58) revandin.
Her wiha çeteyên Artêşa Nîştimanî (polîsa sivîl( şêniyê bi navê Kamîran Dîbor Seydo (44) li gundê Hec Hesna yê navçeya Cindirêsê revand û bir cihekî nediyar.
-2’yê Adarê çeteyên Artêşa Nîştimanî (polîsa leşkerî) bi ser gundê Emara yê navçeya Mabetayê de girt û bi awayekî bê ser û ber lêgerî di malan de çêkirin. Her wiha 3 şênî ji heman malbatê revandin. Navên wan wiha ne: Rozelîn Kemal Murad û hevjînê wê Fethî Ebdulhenan Mihemed (70) û kurê wan Şêrzad Fethî Mihemed.
Çeteyên Artêşa Nîştimanî (polîsa leşkerî) şêniyên bi navên Omer Reşo (43), Nîhad Hesen (37), Ziyad Reşîd Mihemed (48) li navçeya Cindirêsê revandin.
-3’yê Adarê çeteyên Artêşa Nîştimanî bi ser navçeya Mabetayê de girt û şêniyên bi navên Ferhad Henîf ê ji gundê Qenterê, Gîvara Îbrahîm Mihemed, Mihemed Elî Hemkê Hisên û Mihemed Ridwan Mistefa ên ji gundê Eraba ber bi cihekî ne diyar ve revandin.
7’ê Adarê çeteyên Artêşa Nîştimanî (polîsa leşkerî) şêniyê bi navê Ehmed Îbrahîm Henan (48) li gundê Badîna yê navçeya Recoyê, şêniyê bi navê Rêzan Şêx Mihemed (36) li gundê Yelanqûzê yê navçeya Cindirêsê ber bi cihekî ne diyar ve revandin.
-8’ê Adarê çeteyên Firqeya Nehan ên dewleta Tirk a dagikrer zêdetirî 13 şêniyên ku vê dawiyê ji aliyê desthilata Tirkiyeyê ve bi rêya deriyê sînor Cerablusê ji Tirkiyeyê hatine derxistin, revandin ji ber ku li ser bendeke kontrolê ya çeteyan a li nêzî deriyê sînor, qebûl nekirin baç bidin wan.
-19’ê Adarê çeteyên dewleta Tirk a dagirker şêniyê bi navê Mihemed Îsmaîl (41) ji mala wî ya li nêzî nexweşxaneya Dêrsim a Efrînê revand.
-20’ê Adarê çeteyan şêniyê bi navê Mistefa REşîd ê ji gundê Til Tawîlê û ciwanê bi navê Hisên El Nesîrî (22) yê ji navçeya Cindirêsê revandin.
-23’yê Adarê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê şêniyê bi navê Mihemed Hesen Hesen ê ji gundê Mezin ê navçeya Şêrawayê li mala wî ya taxa Eşrefiye ya Efrînê revand.
-26’ê Adarê çeteyên dewleta Tirk a dagirker şêniyê bi navê Şêx Îsmaîl (55) li gundê Kaxirê yê navçeya Mabetayê revand.
-27’ê Adarê îstixbarata dewleta Tirk a dagirker şêniyê bi navê Farûq Mihemed Cemîl Şêxo (49) li gundê Sêmalka yê navçeya Mabetayê revand.

# Xerîb Hiso:Newroza 2024’an ji dijmin û dagirkeran re bû bersiv

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk(TEV-DEM) Xerîb Hiso diyar kir ku ji bo serkeftina doza gelê kurd û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo Newroza sala 2024’an xwedî girîngiyeke taybet bû û wiha got: “Gelê kurd karîn bi îrade û sekna xwe roja Newrozê bi hemû cîhanê bidin qebûlkirin.”

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Di derbarê nirxandina Newroza 2024’an û destpêkirina beşê duyem ji pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Apo, hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk(TEV-DEM) Xerîb Hiso bersiva pisên rojnameya me da. Hevpeyvîn wiha bû:

**-Newroza 2024’an ji aliyê gelên herêmê ve bi coş û îradeyeke mezin hat pîrozkirin, hûn coş û heyecana 2024’an û mesajên ku hatin dayîn çawa dinrxînin?**

Di serî de Newroza 2024’an li Rêber Apo pîroz dikin û di bin silogana ji Rêber Apo re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareserî ev Newroz hat lidarxistin. Heyecana ku gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê divê Newrozê de nîşandan cûda bû ji salên borî, sal bi sal Newroz bi heyecan û bi coşa xwe nûbûnekî bi xwe re tîne. Bi teybet nûjenkirina rihê Newrozê berî 51 salî ji aliyê Rêber Apo ve bû ku çawa di sala 1973’an de yekem car di Newrozê de hazirbûye, naskirin û kûrbûna Rêber Apo di vê Newrozê de çêbûye. Herwiha Karîbû ku rih û mîrasê li gorî rastî û cewherê dîrokê bidê xuyanîkirin. Gelê kurd û hemû pêkhate li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, xwe bi vî rihî û bi vî mîrasî re di çarçoveya felsefeya Rêber Apo de xwe xistine yek. Di heman demê de ji bo azadiya Rêber Apo gelê kurd li hemû qadên Newroza 2024’an xwe îfadekirin û bi rihê vê Newrozê ber bi çareseriyê ve diçin. Gelê kurd bi yek rêziya xwe him di nava xwe



de û him jî di nav gelên herêmê de ku çawa berî 2636 salî gelên arî azadiya xwe çêkirin û yekîtiya û îradeya xwe xurt kirin, herwiha bi dehan zêdetir rêxistina xwe jî li pêş xistin. Tekoşînek bê hempa kir û berdêlên mezin jî li hember desthilatdariyê dan. Gelê Arî yê ku di herêma mezebotamiyayê de jiyan dikirin karîn di 21’ê Adarê de di sala 612’an de bi rûxandina qesra desthilatdarê wê demê yê herî mezin û bidawî anîna zilim û desthilatdariyê de serkeftineke mezin kirin. Heman dîrok xwe dûbare dike,

Di têkoşîna 51 salan ya Rêber Apo de, gelên herêmê û bi taybet gelê Kurd xwe di vê têkoşîn û berxwedaniyê de naskirin û xwedî li îradeya xwe derdikevin. Çawa ku îro roj bi deh hezaran gel beşdarî qada Newrozê dibin, ev tê wateya ku çareseriyê di riya felsefeya Rêber Apo de dibîne. Lewra hemû roj dibin mîtîng, serhildan û berxwedan ev hemû jî xwe di roja Newrozê de îfade dikin, ji ber ku Newroz tê wateya rojek nû û jiyanek nûye. Divê sala nû de bi pêşengtiya jina tekoşer xebatek gelek mezin tê meşandin, loma di Newrozê de rengê jin û ciwanan xwe têde îfada dikir. Roja Newrozê rojek pîroze ne tenê ji bo gelekî yan çandekê, lê belê ji bo hemû gel û pêkhateya ye, dema behsa roja Newrozê dikin her kes kêfxweş dibe. ji ber ku Newroz li ser asta cîhanê bûye rojek cîhanî. Gelê kurd di encama sekin, têkoşîn û berxwedaniya xwe de karîn vê rojê bidin qebûlkirin li cem Netewên yekbûyî û bibe rojek cîhanî. Li seranserî welatên Ewropayê mîtîng, çalakî û tevlîbûnên mezin çêbûn, ev hemû jî nekurd bûn, raste piraniya wan kurd bû lê sal bi sal tê xuyanîkirin ku îradeya gelê kurd di nava şoreşekî deye, hemû pêkhatî jî bi wan re ne di nava vê şoreşê de ku çawa berî 2636 salan karîn zihniyeta desthilatdar bişkînin û heya niha jî bi vê îradeyê berdewamin. Îsal jî gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bersiv û hêz, herwiha bi pêşengtiya jinê jî xemla Newroza 2024’an îfade kir. Sala 2024’an saleke girînge him ji bo azadiya Rêber Apo him jî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd, herwiha ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkên di cîhanê de jî hen.

**-Qonaxa duyemîn ya pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Apo di Newrozê de gihişt lûtkeya xwe, hûn qonaxa duyem û girêdana wê bi Newrozê re çawa dibînin?**

Çav li rêbû ku piştî Newrozê qonaxa duyem ya kampaniya azadiya Rêber apo destpê bike, ji ber ku heta Newrozê qonaxa yekem têr û tije bû û di asta cîhanî de jî ket nava liv û tevgereke pir mezin de. Ev pêngav di herêmê de destpêkir û paşê bû plngavek cîhanî, herwiha hevgirtin û bandoreke gelek mezin çêkir. Di qonaxa yekem de banorek mezin çêbû ku rê li pêşiya naskirina îradê vebû. Herwiha hat diyarkirin ku civak û pêkhateyên ku hene ne aşiqê şer û kuştinê ne. Di qonaxa yekem ya pêngava ji Rêber APO re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareser rê li pêşiya civakê vekir, herwiha hemû civakan dan diyarkirin ku ew jî wek xetekî ne û beşek mezin di asta cîhanê de ne. Li beramberî xeta desthilatdariyê xeta civaka demokeratîk heye, xetên îrade û pêkhateyên ku di çarçoveya demokrasiyê de tekoşîn dikin ji bo azadiyê û berdêlên mezin didin ev xet jî derket pêş. Îro du xet di asta cîhanê de derketine, xeta desthilatdariyê û xeta îradeya demokratîke. Herwiha ev pêngav bandora wê li ser hikûmetên cîhanî jî hebûn, di encama vê berxwedan û tîkoşîna ku him di hundir û him ji derve hatî kirin. Dewleta dagirker xist dibin metirsiyeke mezin de, herwiha Rêjîma Beis jî ket bin bandora vê berxwedaniyê de. Wek berê nema dikarin pilanên xwe yên qirêj bidin meşandin. Qonaxa duyem ya vê hemleyê berxwedanî mezintir dibe û li çareseriyê digere, êdî wê zextek çêbibe ji bo çareseriyê. Di hemleya yekê de zextek ji bo naskirin û bandor bû, ev qonxa duyem qonaxa çareseriyê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, ku ev 25 salên wî derbas bûn di girtîgehê de û tu kes li rewşa wî napirse û dengê xwe nake. Wî weke dîlekî ji bo azadî, aşîtî û demokrasiya gelan nabînin, bi sed hezaran gel bang dikin jî lê hemû dewlet xwe bêdeng dikin.

**-Ji bo qonaxa duyem ya pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Apo bi ser bikeve, ji niha û pêve pêwîste çi were kirin?**

Pêwîste em destekê bidin û ji berê zêdetir kar û xebata xwe xurt bikin, ji bo Rêber Apo pêngava îmze û şandina mektûban heye, ji 12 saziyên Navdewletî re mektûb tên rêkirin, her kes dikare vî karî bike. Lê mixabin herkes bi navê demokratiyê diaxive lê tu kes pêk nayîne. Di vê qonaxa duyem de herkes bi berpirsiyatiyeke exlaqî nêzîk bibe, çi kesayet, sazî, partiyên sivîl û civak be jî, divê bikevin di nav liv û tevgerê de. Ev yek jî dibe sedema ku yek rêzî deha zêdetir xurt bibe, herwiha di nava pêhateyan de jî yekîtî û hevgirtin xurt dibe. Bi vê şêwazî jî em ê bikaribin vê qonaxê biser bixin. Herkesê ku dixwaze bi azad û demokrat bijî, divê azadiye Rêber Apo ji xwe re esas bigre, ji ber ku bi azadiya Rêber Apo re çareseriya hemû pirsgirêkan jî çêdibin. Îro îradeya gelan xwe daye pêş û gelê Kurd pêşengtiyê dike, him di asta herêmê de him jî di asta cîhanê de. Herwiha pêşengtiya gelê kurd di çarçoveya felsefeya Rêber Apo de ye. Nimûne; Agirê Newrozê bû agirekî cîhanî, ji ber agir sembola azadî û îradeya Azad e, herwiha sembola aşîtî û wekheviyê ye. Di asta cîhanê sax de ev agir salê heta salê tê bikar anîn û gelê kurd jî salê heta salê agirê Newrozê agirê azadiyê pêdixin. Agir bû cîhanî û niha jî Newroz jî bûye cîhanî, herwiha piradîgma Rêber Apo jî bû cîhanî. Ev tê wateya ku metirsî ji bo serkeftinê nemaye, çiqasî em têkoşînê xurt bikin hewqasî em ber bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ve diçin.

# Dehaqên nû kî ne?

**Volqan Elî**

Gelê Kurd gelekî qedîm ê cotkar, şivan û gavan e. Miriyê azadiyê ye. Vê taybetmendiyê bi me Kurdan gelek tişt daye qezenckirin. Ne tenê bi Kurdan, bi tevahiya mirovahiyê daye qezenc kirin. Kevneşopiya Newrozê jî yek ji wane.

Mirov hema nebêje ‘cotkarî û şivanî û gavanî çi ye!’ Însan bi cotkariyê, nan û dexla xwe ji erdê hilbirandiye. Dema hêzên dagirker ên çavnebar, çav berdane ked û erda wî, di berdêla mirinê de ew parastine. Bi kurtasî çîroka Cejna Me Ya Azadiyê Newroz jî ji beriya hezaran sal wisa peyda bûye.

Armanca me ne ew bû em li ser Newrozê binivîsin. Me tenê xwest, em hin tiştên ku ne li gorî xwezaya xwe ne, ecêb in bînin ziman.

Hûn ê bêjin, ‘Çima?’

Tê naskirin: Hakkan Fidan wezîrê şer ê dewleta dagirker ê Tirk e. Heya vê derê tiştekî ecêb û sosret tine. Her çendî ji aliyê dîrokî ve ne wisa jî be, em xwe diavêjin ber bextê pêşiyên xwe, gelên qedîm ên Rojhilata Navîn û ji wan efûya xwe bixwazin. Ji ber ku ev ji aliyê dîrokî ve ne asayî ye. Wekî qewmê Turanî, Tirk, ji Asyaya Navîn hatine Kurdistanê, gelên Anatolî, gelên, Ermen, Rum, Ereb û Fars dagir kirine û ji beriya sedan sal ji xwe re împaratoriyên xwînî ava kirine. Herî dawî jî cumhuriyeta Tirkiye. Vê dewleta zordar bi milyonan Ermen, Kurd, Aşûrî, Rum qetil kirine. Qirra miletê Ermen anîne, yên mayî ajotina jorê Serheda Jorîn, Ermenîstaneke req û hişk û bê berhem ji wan re diyar kirine.

Hê çend salan berê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji şoreşa Rojava qut kirine. Li herêmê ne ku Kurd, darên Xweda jî kokê wan qelandine. Ne ku nahêlin Newroz were pîrozkirin, her roj zarokên Kurdan dikujin û diavêjin bîran. Dibêjin “em ê kokê Kurdan ji binî de biqelînin”. Ev Hakkan Fidan jî di vê serdemê de ji xwe re kirine Wezîrê Şer. Dema wan şeran de jî serokê MİT’ê bû. hemû xwîna Kurdan ku di vê serdemê de dirije, tevî Erdogan ew berpirsiyar e: hema bêje wekî Dehaqê dawî be!

Tiştekî sosret û balkêş!

Ev kes rabûye, bi destê xwe yê di nava xwînê gelê Kurd de Newrozê pîroz dike. Na, we şaş nexwend! Newrozê pîroz dike. Gotineke Kurdên qedîm heye, dibêje “bi gur ve nêçîr dike û dixwe, bi şivên ve (pez) lê digere”. Her çi hebe, rastî û heqîqet, di kevneşopiyên civakê de ye. Niha em ê ti lêkolîn û analîzên cuda, zanist û felsefeyên cuda nekin, ji bo niha ne pêwîst e jî. Tenê em ê guh li pêşiyên xwe bikin. Jixwe di fikra faşîzma Tirk de ‘gurên boz’ wekî îlah tê şîrovekirin. Wisa dibînin. Hakkan Fidan wezîrê şer ê dewleteke dagirker e. Her roj her kêlî xwîna zarokên Kurdan dirêjîne. Bi çi curetê radibe û cejneke wekî Newrozê, cejneke azadiya gelan pîroz dike. Wekî di gotinê pêşiyan de dibêje, hem bi xwe ‘gur’ e û hem nêçîra Kurdan dike, hem jî cejna azadiya gelê Kurd pîroz dike. Em wisa dinivîsin lê ew bixwe dibêje “birayê min Barzanî ez Newroza te pîroz dikim”. Jixwe em nikarin pêşî lê bigirin, ew dikare hin tiştan pîroz bike lê ne Newrozê. Mînak, dikare biryara mala Barzanî ya tevlînebûna hilbijartina Îraqê pîroz bike. Manedar e. ji ber ku bi dilê wan e. bila destê xwe nede Newroza gelan! Di serî de dilê gelê Kurd û dilê gelan, dilê kesên azadîxwaz pê diêşe.

Newroz ji aliyê gelê Kurd û gelên azadîxwaz ve bi taybetî li Bakur ji aliyê milyonan ve hate pîrozkirin. Eger bi rastî jî Hakkan Fidan wê şevê xewn xwe dîtibe, çima Newroza Amedê, yan jî li nêzîkî wî ya Stenbolê hebû, ew pîroz nekir? Çû ta li Hewlêrê cejna Barzanî pîroz kir.

Wekî gotina pêşiyan dibêje, gelo bi hev re tiştek xwarine û ji ber wê radibe li cejna Kurdan digere?

Gumana me ne ji pêşiyan û ne jî ji gotinên wan heye; ew pîroz in û rêya rastiyê pêş me dikin. Xiyaneta Harpagos em ji wir fêr bûne.

Eger ne wisa bûya divê wekî her Kurdekî malbata Barzanî ( ew ji xwe re dibêjin em Kurd in) jî bigotana, “em pîrozbahiya te qebûl nakin, hê doh balafirên te, li gundên Metîna-Garê çend Kurd qetl kirin”. Na, berewajî, bi şahnazî û kêfxweşî, vê, di ragihadina xwe de wekî nûçe diweşînin!



# MED TV yekemîn televiziyona kurdî

MED TV yekemîn televizyona kurdî ya satelîtê bû, di 15’ê Gulana 1995’an de dest bi weşana xwe ji bajarê Londonê kir. Studyoyên MED TV li London, Îngilîstan û li Belçîkayê hebûn. Weşana bernameyan bi 5 zimanan: kurdî ( zaravayên Soranî, Kurmancî û Zazakî) Îngilîzî, Erebî, Suryanî û Tirkî dihat weşandin.

**Deriya Çiya/Qamişlo**

MED TV di 15’ê Gulana 1995’an de dest bi weşanên xwe ji bajarên Londonê kir. MED TV rojane şeş demjimêran bi zimanên kurdî, Tirkî, Asûrî û Erebî weşana xwe dikir û li Ewropa, bakurê Efrîqa û Rojhilata navîn dihat temaşekirin. MED TV bi vê yekê gaveke mezin di dîroka çepemeniya kurdî a nûjen de avêt û sînorên di nav kurdan de bi riyeke modern, bi riya teknolojî rakirin.

### Navlêkirina MED TV

Yekem televizyona Kurdî û ya Kurdan navê xwe ji yekem şaristaniya Kurdan, ji Medan wergirtibû. MED TV, 2500 sal piştî hilweşîna şaristaniya Medan, dest bi weşana xwe kiribû. Di vê pêvajoya dîrokî de ji bo Kurdan pir tişt neguherîbûn. Kurdistan her di bin dagirkeriyê de bû û Kurd her di nav têkoşîna neteweyî de bûn. Zimanê wan qedexe bû, navê welatê wan tinebû, serok û pêşengên wan yan li zindanan, yan li çiyayan, yan jî li sirgûnê bûn. Yekem weşangeriya televizyona satelîtî ya Kurdan jî bi vî awayî li sirgûnê, li dûrî welêt, li Belçîkayê dest pê kir.

### Efsûna MED TV xeyal vejandin

MED TV wek ruhekî biefsûn li ser xaka Mezopotamya geriya, çand, folklor, ziman, adet, tore, muzîk, stran, çîrok û xeyalên mirovên van zewiyên xemgîn, careke din vejandin.

Lê di ekranên MED TV de, bi gelek ziman û zaravayên ku li dijî zextên dewletên dagirker li ber xwe didan, weşan dihat kirin. Zimanê Kurdî tevî çar zaravayên xwe her şev ji ekranên televizyonan ber bi hesret û xeyalên Kurdan ê hezaran salan ve diherikî.

Her wiha zimanê Asûrî/Suryaniyan ku di bin heman zextan de ye, ji ekranên vê televizyonê digihişt ser zeviyên ku koka xwe jê distîne. Zimanekî din, zimanê qewmê Lazan, ew jî ku li Tirkiyeyê qedexe ye; carinan bi stran û kilamên xwe li dijî dijminên mirovahiyê li ser ekranên vê televizyonê derdiketin pêş.

MED TV ji bilî van zimanên qedexekirî, her roj di demên cûr bi cûr de bi Tirkî, Erebî û Ingilîzî jî weşan kirin. Kilamên Ermenî, Farisî û gelek zimanên din jî car caran di ekranên vê televizyonê de derketin pêş.

Serketina vê kanala televizyonê belkî jî ew e ku wek dengê Rojhilata Navîn pirrengîn û hesreta însanên wê herêmê biqeda, hesreta biratî, demokrasî û wekhevîyê di ekranan de be jî anî bû ziman.

Her wiha oldarên Îsewî, Misilman, Elewî û Êzîdî di rojên xwe yên pîroz de li ser ekranên MED TV civiyan; qesîde û duayên xwe gihandin hemû mirovan. Di rojên pîroz ên van komên olî de, şahî û bernameyên taybet jî pêşkeş dikirin.

### Astengiyên weşana MED TV

Ji destpêka weşana xwe de MED TV bi zextên dewleta Turk re rûbirû ma ye. Beriya ku MED TV dest bi weşanê bike, dewleta Turk ket hewlidanan û MED TV bi piropogendên nerast li ber çavê raya giştî û dewletên Ewropa reş kir û weke televiziyona PKK’ê îlan kir. Paşê bi zextên li ser Elmaniya, Birîtaniya mezin, Polanda, Spaniya, Fransa û Protûgalê xwest MED TV bidê rawestandin. Di Gulana 1999’an de kominisiyona televiziyona ya Birîtanî (Independet Televizion Commission ITC) lîsansa MED TV betal kir û weşanên wê rawestandin. Lê sê meh şûn de, di Tîmeha 1999’an de Mediya TV dest bi weşana xwe kir û cihê MED TV girt.

### Mediya TV

Piştî girtina yekemîn televiziyona kurdî ya li ser satelîtê MED TV, di sala 1999’an de televiziyona Mediya TV dest bi weşanên xwe kir. Mediya TV jî di sala 2004’an de hat girtin û li şûna wê Roj TV dest bi weşana xwe kir.

### Roj TV

Roj TV di 21’ê Sibatê de dest bi weşanên testê û di 1’ê Adara 2004’an de bi resepisyoneke vekirinê bi fermî dest bi weşanên asayî kir. Ji Gulana 2004’an û şûn de Roj TV di înternêtê de zindî tê temaşekirin.

### Di şoreşa Rojava de pêngaveke ragihandinê ya bi kalîte

Ev xebata ragihandinê ya berdewam ji bo serdemên navber, ji sala 2011’an û vir ve, bi destpêkirina serhildana gel û şoreşa gelên Sûriyê û ya ku mîna şoreşa ragihandinê li Rojava, pêk hat. Şoreşa gelê Kurd a li Rojava ku ji bo li dijî rejîma totalîter û netewdewletê hat destpêkirin, di asta çapemeniyê de şoreşeke girîng bi dest xist. Hevdem bi mezinbûna şoreşê re, rojnamevanan karîn gelek platformên medyayê yên wekî rojnameya Ronahî, Ajansa Nûçeyan a Hawarê û kanala satelîtê ya Ronahî ava bikin. Ev platformên çapemeniyê bûne dengê projeya neteweya demokratîk a ku li herêmê pêşketiye. Van platformên medyayê her wiha êrîşên çeteyên DAIŞ’ê eşkere kirin, her wiha bi mezinkirina berxwedana li dijî DAIŞ’ê re hembêz kirin û piştre jî ji bo eşkerekirina êrîşên dewleta Tirk a dagirker û peymanên bi guman û qirêj ên di navbera dewleta Tirk, çeteyên El-Nusra de xebitîn.

### Rojnameya Ronahî

Li Rojava bi destpêka şoreşê re Rojnameya Ronahî mîna yekemîn desgehên ragihandinê bi riya komek ji xebatkarên dildar dest bi karên xwe kirin û di 16’ê Cotmeha 2011an de yekemîn çapa xwe destpêkir. Bi destpêkirina Rojnameya Ronahî re gaveke giring di warê ragihandinê de hate avêtin û roj bi roj di nava civakê de bandora wê her ku çû mezin bû û ji derfet û imkanên kêm û bi çend endaman kar hate destpêkirin û îro gihiştiye astekî ku nûçegihanên xwe li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê belavbûne û ji gelek welatên Rojhilata navîn jî nivîskarên xwe jî hene. Her wiha bûye navnîşana ragihandina rastiyê û vegotina şoreşê.

### ANHA

Ajansa Nûçeyan a Hwarê (ANHA) di 1’ê Adara 2013’an de ji aliyê hinek rojnamegerên Kurd ve hat avakirin. ANHA’ya ku weşana xwe di malek ji kerpîçan de destpêkirî, bi hişmendiya xwe ya bêalî û nûçeyên rast, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû saziya çapemeniyê ya herî giring.

ANHA’yê ragihandina Netewa Demokratîk a ku li Rojhilata Navîn derket û berxwedana gel ji cîhanê re esas girt. Nûçegihanên ANHA’yê, bi berdêlên giran wek şahîdbûnê jî, di her şert û mercên zehmet de nûçegihaniya rast kirin û di israrê de yek gav paşde neavêtin. ANHA’ya ku niha di sala xwe ya 10’an de ye, toreyek wisa da avakirin ku şoreşa gel a li herêmê, berxwedana ku li dijî çeteyên DAIŞ’ê hat meşandin gihand tevahî cîhanê. ANHA li herêmê xeta weşana ji rastî û heqîqetê tawiz nayê dayîn dide meşandin û rojnemegerên giring ava dike.

### RONAHÎ TV

Ragihandina Azad kevneşopiya ku bi Med Tv dabû destpêkirin hat girtin jî, li rexma hemû zextan ev kevneşopî domand. Ronahî TV di 20’ê Cotmeha 2011’an weşana xwe ya testê da destpêkirin û destpêkê di rojê de tenê sê saet weşan dikir. Di demek kurt de ev dem gihişt 10 saetan û di sala 2014’an de jî saetên weşanê gihand 24 saetan. Ronahî TV di rojên avakirina xwe de li bajarê Brukselê yê Belçîkayê dest bi weşanê kiribû, di demek kurt de navenda xwe ya nûçeyan derbasî xaka şoreşê kir. Niha Ronahî TV studyoyên xwe li hemû kantonên herêmê vekiriye. Li kêleka Şoreşa Rojava, pêşketinên li Rojhilata Navîn digihîne hemû cîhanê.

### Stasyonên radyoyê

Di 20’ê Cotmeha 2012’an de yekemîn radyoya Rojava bi navê “Cûdî FM” hat avakirin û bernameyên xwe ji bajarê Qamişlo diweşand. Paşê di 19’ê Mijdara 2012”an de Radyoya FM ya Kobanî hat damezrandin û di 1’ê Nîsana 2013’an de Radyoya Rojava FM dest bi weşanê kir. Li Efrîna ku niha ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye dagirkirin, di 10’ê Hezîrana 2013’an de Radyoya Efrîn FM hate avakirin û di 1’ê Îlonê de weşana asayî ya Radyoya Efrîn FM dest pê kir. Di navbera salên 2014-2015’an de gelek radyoyên wek Derbasiya FM, Waşokanî FM, Dengê Xabûr, Dengê Rêveberiya,Orkêş, Xweseriya Demokratîk û Rojava FM hatin avakirin. Di sala 2017’an de radyoya jinan bi navê Radyoya Star FM Jî dest bi weşanê kir.

FENER



## Mizgîniya Tevgera Azadiyê Misogeriya Pêşeroja Birûmet e

**Idrîs Henan**

Mehek zêdetir agirê Newrozê şewqa xwe li her derê belav bûye û tarîtiya di quncik û koşeyan têk biriye. Êdî tiştek bin cilê nemaye, Newroza îsal bersiva hemû dudiliyên sergeşt bû. Çeja li Newroza 2024`an zêde bûye, mizgîniya Gerîlayên Azadiyê bû. Lew re, Newrozeke afrîner, xwedawendî û vejîner bû. Bi dehan milyonan Kurd, Kurdistanî û dostên wan li tevayî dunyayê bi ruhê berxwedana Îmraliyê Newroz pîroz kirin. Agirê Kawayê hemdem, Mezlûm Dogan û qêrîna zayîna yekem a Egîdan bi mizgîniya bidestxistina fûzeyên xistina balafirên bêmirov û xistina 15 celebên balafirên bêmirov, geş û bilind bû. Bi wê mizgîniyê re, giyana tolhildêr û berxwedêr mezintir bû. Bi gotinek din; çawa ku berxwedana Mezlûman û Egîdan naveroka têgihaştina şoreşgerî ya Tevgera Azadiyê diteyisîne, Mizgîniya Fermandariya Giştî ya Hêzên Parastina Gel HPG jî, zîrweya wê naverokê ye.

Di demekê de ku tecrîda li Îmraliyê girantir bûye, sîstema îzolekirinê li tevayî beşên jiyanê kengere bûye, dagirkerên Kurdistanê û cehşokên Kurdan li ser têkbirina têkoşîna gelan a azadî û demokrasiyê di nava têkîlî û hevkariyê de ne, berxwedana Kurdan li çar beşên Kurdistanê bi ser dikeve û li tevayî dunyayê belav dibe, mizgîniya Newrozê ya Hefteya Qeheremaniyê hat. Aliyê wê zeman mekan ve, gelek girîng û watedar e ku helwesteke xof û tirsê di dilê dagirkeran de çêdike. Ji ber ku di wexteke wisa de ku dagirkerên Kurdistanê û ezbeniyên wan amadekeriya oparasyonên qirkirinê dikin, ev mizgînî weke hedekî şoreşgerî yê ku hevkariya wan vala derdixîne, derkete holê. Her wiha, aliyê stratejîk a pêvajoya dîrokî ya têkoşîna gelan a ji bo azadî, xilasî û demokrasiyê ve, pêngaveke zanista şoreşgerî ku li dibistana şoreşgerî ya cîhanî de zêde bû. Ango; zanista bi paradîgmaya misogerkirina azadiyê, bi vê mizgîniyê tacîdar dibe û çi rê û rêçikên têkoşîn, berxwedan û vîna xilasiyê hebin, bi cîhana berxwedêr re hate parvekirin. Mizgîniya Tevgera Azadiyê ya Newroza 2024`an, belansa diyalektîka dualîteyên çêkirî û ferzkirî sererast kir û hemû nelirêtiyên hebûn, tûşî ji nû ve hesabkirin û fikirînê kirin. Yanê; diyalektîka civakî ku dîrok bi zanista gel aniye vê kêliya îro, ji nû ve xistiye meriyetê û li beramberî çêkiriyên modernîteya zor û şîdetê, xuliqkariya xwezayî ya modernîtaya demokratîk a dayîksalariyê vejand. Ji ber vê jî Newroza îsal cudayî hemû Newrozên derbasbûyî ye ku yekem car e, di dirêjahiya dîrokê de, gelê Kurd insiyatîfê ji destê celadên xwe digire û wan dajo koşeya tarî ya wendakirinê. Pratîka artêşa dagirker a faşîzma tirk li çiyayên Herêmên Parastina Medya, wendabûna mijara gotinê isbat dike. Rûyê dîtir a vê mizgîniyê jî ew e; ku hemû hewldanên faşîzma tirk yên reşkirin û bêbandorkirina Tevgera Azadiya Kurdistanê aliyê siyasî, leşkerî, dîplomasî û civakî ve, badilhewa çûn. Ev mizgînî ne tenê meseleyekî leşkerî ye, meseleyek di eslê xwe de polîtîk e ku serketina senteza azadiya gelan a bi pêşengiya paradîgmaya Rêber Apo pêş ketiye nîşan dike. Ji xwe hembêzkirina navneteweyî ya hemleya; Azadî ji bo Rêber Abdulah Ocalan, Çareseriya demokratîk ji doza Kurd re, wê serkeftinê bê şîrove rave dike. Îroj ev serkeftin di karakterê Newroza îsal de, bi mizgîniya Tevgera Azadiyê re xwe li hemû meydanên siyasî, dîplomasî û leşkerî dide der. Ango; îroj cîhana ku di çirava kaos û aloziyên çêkirine de, vekeviziye, bi mecbûrî berê xwe ber bi Îmraliyê ve ye. Çinku ti rê ji bilî Îmraliyê li ber wan nemaye. Mizgînî jî di wê wateya polîtîk û leşkerî de stratîjk û di wextê de ye ku pêşeroja azad a gelekî hatibû keviyê tunebûnê misoger dike.